# Nordrhein-Westfalen setzt vereinbarte Maßnahmen zur Bekämpfung des Corona-Virus konsequent um

**Danzanîna Çapemenîyê - 907/10/2020**

# Bakurê Ren-Vestfalyayê tevdîrên li ser têkoşîna bi koronavayrûsê re biryar li ser wan hatî dayîn dixe rewacê

**Birêvebirîya eyalete danzanîna jêrîn belav kiriye:**

Tevdîrên di tarîxa 28ê çîrîya pêşîn de di gava kombûnên danzanînê yên di nava şansulye û serekên eyaletan de sitandî, ji alî Birêvebirîya eyalete ve tê xistin rewacê.

Serekwezîrê eyalete Armîn Laschet vê daye zanîn: “Rewş gelek ciddî ye. Ji bo em rê li ber krîzeke sihetê bigirin divê em di çarçoveya neteweyî de têbikoşin. Ji bo vê yekê jî bi mebesta ku em bi awayê biserketî belavbûna enfeksîyonê dîsa hêdî bikin, divê em bihevvebûna bi kesên din re bi lez û bi îstîqrara kêm bikin. Divê bar pir nekeve ser pişta sîstema xwedîkirina sihetî. Di heman demê de em dixwazin xwe ji girtineke bi temamî jî dûr bikin. Em dixwazin navendên xwedîkirinê, xwandingehan û cîhên karî vekirî bihêlin. Divê em hevkar bin. Bakurê Ren-Vestfalyayê dikare di vê yekê de bi ser bikeve. Me di mehên adarê û nîsanê de vê îsbat kir.”

Wezîrê sihetê Karl-Josef Laumann vê da zanîn: “Kesên bi şofa koronavayrûsê dikevin teqez bêtir dibin. Êdî hema bejin em li her herêmeke Bakurê Ren-Vestfalyayê belavbûneke zindî û her timî dibinin. Bi tenê bi bizaveke bibiryar ev ava dikare bê rawestandin. Ji bo em zincîrên enfeksîyonê karibin bişkênin divê em pêvebûnên civatî binin asta herî kêm. Ji bo em mirovên herî hesas ên di nava xwe de biparêzin her tiştî bikin.”

Di sipêdeya 30yê çîrîya pêşîn a 2020î de ji alîyê RKI-yê ve li Bakurê Ren-Vestfalyayê 5.398 bûyerên enfeksiyona COVID-19ê hatiye raportkirin, hema bejin bi tenê 4.291 ji wan jimarên doyî ne. Asta bûyerên hefteyî ya neteweyî (ji nav 100.000 kesan ve bûyerên di nava heft rojên paşîn de dixuyîne) bêtir dibe û îro gihîşt 140î. Wezîr Laumann ev pê ve kirin: “Vêga her kesekî pêketî bi kêmayî derbasî 1,2 kesan dike.

Eger ev bêyî hêdîkirinê dewam bike, divê em li hêvîyê bin ku jimara textên vala yên di jorên rewşa awarte de hene îsal bi nexweşên COVID-19ê tije bibin. Di vê rewşê de di serî de alavên bêhnsitandinê, ji bo firehkirina kapasîteyê dibe bivê tevdîrên din bên sitandin. Ev awa wek rewşa meha adarê ye, di wê dewrê de ji nexweşxaneyan re hatibû gotin ku ew heta ji destê wan bê dermankirinan bi paş ve biavêjin, eger na, dê bivê klînîkên rehabîlîtasyonê yên Bakurê Ren-Vestfalyayê bi kar were.”

Li gora vê rewşê, Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê yên heye yên pîlanê wan dihat kirin ew di 31ê çîrîya pêşîn de bi dawî werin, ew heta 1ê çîrîya paşîn hatin dirêjkirin. Piştî 2yê çîrîya pêşîn wek ji asta federal tê fehmkirin, dê li Bakurê Ren-Vestfalyayê fermanên nû yên qanûnên bikevin rewacê.

Qaydeyên nû, digel bûyerên din, qaydeyê navber-paqijî-maskeyê yê gelek giring eşkere dike û çarçoveya wê bêtir dike yek awa. Ji 2yê çîrîya paşîn pê de li hemû avahîyên li wan çûn û hatina mişterîyan û serdêran hene divê maske bê lixwekirin. Qaydeyên nû ji bilî van peyameke giring bi xwe re tîne: ji bo karina şikandina vê pêla enfeksîyonê, xwandingeh, hînkirinên şagirtîyê û hemû pêvebûnên têkilîya wan bi karî tune ne di seranserê meha çîrîya paşîn de divên bê xistin asta herî kêm a mumkin bin.

**Bi gotineke din:**

- Kombûnên di cîhên gelî de dibin bi kesên ji mala wî kesî bixwe yan yan kesekî ji maleke din re bê pêkanîn. Di rewşeke wisa de jî divê destûr ji bêtirî deh kesan re neyê dayîn.

- Li cîhên taybet teşwîqa erênekirina kombûna kesên ji derveyê mala kesekî tê kirin, eger ew mumkin nînbe, bi dijwarî salixê pêkanîna vîyana navber-paqijî-maskeyê tê dayîn.

- Turist otobüsü gezileri ve turizm amaçlı diğer otobüslü grup gezileri yasaklanmıştır.Qonaxvedanên şeve yên bi mebesta geştê qedexe bûne. Ji bo geştên berî 29ê çîrîya pêşîn destpêkirî ev awa ne di rewacê de ye.

- Avahîyên xizmeta xurekîyê dikin divên bên girtin. Di nava vê de eger mumkin be dayîn yan sitandina xwarinê ya bikarhatina ji bo malan tune ye.

- Hemû çalakîyên kêfê û bêhnvedanê divên bên betalkirin.

- Ev ên jêrîn divên bên girtin:
  - tîyatro, opera, eywanên konsertê û avahîyên wekî wan
  - konferans, pêşangeh, bazarên salanî, bazarên tiştên ji destan
  - sinema, parkên kêfê, baxçeyên gîyaneweran û çalakîyên din ên bêhnvedanê (li hundirî û li derve)
  - qumarxane, firoşkarên ganyanê û avahîyên wekî wan
  - ji bilî sîporên yekkesî yên derve, hemû sîporên li avahîyên gelî û yên taybet ên atletîk ên bi mebesta bêhnvedanê û amatur
  - birkên soberîyê, parkên avê, eywanên jîmnastîkê û avahîyên wekî wan
  - kerxane, cîhên rêncberîya cinsî û avahîyên wekî wan

- Digel dermankirinên bivênevê yên sihetî yên wek dermankirina fizîkî, ji bilî eywanên çêkirina pêyan û yên berberîyê, xizmetên di wan de nêzbûna fizîkî hene hatine qedexekirin.

Wezîrê Sihetê Karl-Josef Laumann vê gotiye: "Digel ku dê ji bo cîhên karî yên bên girtin bihevxistinên telafîkirinê jî bên kirin, em dizanin ku tevdîrên me gelek cidî ne. Gelek cîhên karî yên ku di mehên çûyî de ji bo ji vayrûsê parastina mişterî û mêvanên xwe gelek têkoşîyane di binê bandorê de dimînin. Lê eger em bi biryar belavbûna vayrûsê hêdî nekin em îqna bûne ku dê cîhên karî yên xizmeta xurekîyê, kulturê, sîporê û bêhnvedanê zirareke pir mezintir bibînin.”

Qaydeyên Rojanîkirî yên bi Mebesta Parastinê dê heta 30ê çirîya paşîn di rewacê de bin û yek dikare xwe ji vê derê bigihîne wan.

*Ji bo pirsên welatîyan jimara têlefonê: 0211 855-5.*

*Ji kerema xwe pirsên xwe yên li ser danzanîna Çapemenîyê bişînin nivîsîngehana çapemenîyê ya Wezîrîya Karkirinê, Sihetê û Karên Civatî - têlefon: 0211 855-3118.*

*Yek dikare xwe ji vê navnîşanê bigihîne danzanîna çapemenîyê: www.land.nrw*

*Siyaseta veşarîbûnê ya çapemenîya civatî*